Ger destdirêjiyeka wisa ji layê hêzên asayîşê ve çêbûbe, ji nedîtî ve tên, her wekî ku tiştekî wisa çênebûye. Ger li gund, li navçeyê, li bajêr ev peywendî bi yekî ji gelê wan re çêbûbe, hingê dibêjin "namûsa me herimî, tenê kuştin dikane viya paqij bike", Lêbelê ger ev destdirêjî ji layê endamekî hêzên asayîşê ve bête kirin hingê nabe mesele. Ew mêrê ku dibêje namûsa me herimî û bi xwînsarî gule berdide xwişka xwe, qet bala xwe nade ser pêvajoyeka wisa, li ser vê yekê nafikire. Dîyardeya namûsê çawa ku li gorî cih û zemanê ku bûyer rû daye diguhere, herwisa, li gorî nasname û pîşeya mêrî jî diguhere. Divêt ev peywendî, ev têgihaştin bi têgehên antropolojîyê bêne fêmkirin, bêne têgihaştin û rexnekirin.

Meclisa malbatê sazîyeka pîrîmîtîv e. Wekî mînak, di warê rêvebirina debara malbatê de, di warê kirîn û frotinê, yan jî bo kirê dayîna milk de biryareka meclisa malbatê tune ye. Bona biryarên ekonomîkî ti pêwîstîyek bi meclisa malbatê nîn e. Derbareyê arîşeyeka aborîyê de nayê gotin ku "malbat civîya û biryareka wisa girt" û H.W.D. Wezîfeya meclisa malbatê tenê ew e ku derbareyê jin yan jî keçekê de bi mebesta ku li derveyî edet, dab û nêrîtan peywendî bi yekî re danîye biryara kuştinê bide… Ji bilî viya tu roleka wê nîn e. Dema ku çapemenî dibêje "meclisa malbatê civiya", "meclisa malbatê biryar da" hingê ev yek ji bilî ku vê meclisê zinde bihêle ne tu tiştekî din e. Ger mesele were ser pirsa Kurd, hingê ev sazîyên kovî yên wisa ji layê dewlet û hukûmetê ve, ji layê çapemenîyê ve berevaniya wan tê kirin, wan teşwîq dikin. Statu didin van sazîyên kovî, wan geş dikin, pêşde dibin. Û bi vî awayî dikin ku ev sazî xwe birêxistin bikin, mayînde bibin. Wekî mînak, di zivistana sala 1990î de hindek serekên korucuyan (cehşan) bo Anqereyê hatibûn vexwendin. Ligel wezîrê navxweyî û serekwezîr û serokkomarî hevdîtinan çêkiribûn. Wê demê jî çapemenîyê wisa nûçe belav kiribûn: "Serekê eşîra Batûwan …, serekê eşîra Tayan …, serekê eşîra Jirkî …, serekê eşîra Mexmûran … li Anqereyê ne. Ev serekên eşîran ku li ser vexwendinê hatine Anqereyê …" Li televîzyonan bi tevî dîmenên wan ve bername hatibûn çêkirin. Bi vî awayî dezgayê eşîretîyê hatibûn zindekirin, hatibin parastin û geşkirin, hewl dabûn xwe da ku statu bidin van dezgayan. Di proseya berxwedanê de bi destê polîtîkaya dewletê eşîret wekî dezgayek hatibûn rêxistinkirin. Lêbelê ji layê din ve serokwezîr Bülent Ecevitî di dema serokwezîrtîya xwe de destûr nedabû şaredarên HADEPê da ku werin pirsgirêkên xwe rabigihînin wî. Ecevitî bi mebesta ku "ew xwe ji rêxistina terorê dûr nagrin" jîvan nedabû wan.

Ez dixwazim bibêjim ku çapemenî têgeha meclisa malbatê derdixîne pêş, hewl dide xwe da ku statuyekê bide vê dezgeya prîmîtîv, bi baldarî dixwaze vê diyardeyê bike sazîyekê. Gelo ev meclisa malbatê dikane biryarek wekî "di girtinên komelê de em naxwazin jinên ciwan li cihekî din girtî bimînin, wan ji komelê veqetînin û bibin cihekî din, em qebûl nakin ku ew li cihekî din girtî bimînin…" bigrin?. Dikane biryarek wek "em ê jinên xwe